Destpêka Dîwana Melayê Cizîrî û Qesîdeya Wî ya Musemmet

“Newaya Mitribê Çengê”

Azad ZAL
azadzal@hotmail.com

PÊŞNÛMA

1- Pênas û vegotina têgîna Qesîdeyê
a- Qesîde
i- Pênasa Qesîdeyê
ii- Teşeyê Wêjeyî yê Qesîdeyê
iii- Beşên Qesîdeyê
iv- Binavkirina Qesîdeyê
v- Di dîwanan de rêzkirina qesîdeyan
b- Musemmet / Qesîdeyên Musemmet
c- Ted(z)mîn (dat)
2- Di qesîdeyê de hesabê ebcedê
3- Pîvan û rêzbendiya qesîdeyê
4- Li gorî destnivîs û çavkaniyên di destê me de metna qesîdeyê
5- Bikaranîna Nav (Mexles) û li nava rêzên qesîdeyê danîna dîrokê
a- Bikaranîna Mexlesê
b- Di Qesîdeyê de Hesabê Ebcedê
6- Çavkaniyên ku me serî li wan daye

1- Pênas û vegotina têgîna QESÎDEyê

a- Qesîde:

i- Pênasa Qesîdeyê**:** Qesîde peyvek bi erebî ye. Ji “QESEDE”ya Erebî tê. Tê wateya *“niyet li tiştekî/ê anîn; bi zanîn baldayîn û kirina kiryariyekî; nêzikbûn û xwesteka li ser tiştekê/î“* ye. Li gorî têgihîştina tasawufê ji bo ku bala evînê (eva ku jê tê hezkirin) bê kişandin û li gorî xwestek û pêdiviyên evînê bêne cih; dilê evînê xweş bibe xwe-parastina ji her tiştî û xwe vekişandina viyanî ya ji her tiştî ye. Qesîde li ser vê wateyê diriste.

Helbest û honandinên wêjeyî yên ku ji bo evînê (*di tasawufê de **Evîna Xweda***) hatine gotin û nivisandin qesîde ne. Ev ji aliyê batinî ango tasawufî ve pesindayîna **Evîna Xwedê** û ji wê gazin û giliyan kirin e.

Ji aliyê zahirî ango jiyana pergala civakî ve qesîde ji bo pesindayina yekê û li ser wê standina pere ye. Qesîdeyên bi vî rengî ji bo serdar û pêşevan û padîşah û mîrên demê re têne nivisandin.

ii- Teşeyê Wêjeyî yê Qesîdeyê**:** Ji aliyê teşeyî ve di navbera 9 û 100 malikî (beyt) de qesîde têne nivisandin. Pîvan û qalibê qesîdeyê wekî aa/ba/ca/da…… ye. Ji malika (beyt) pêşî re **metle**’ tê gotin. Malika pêşîn her du rêz bi hev re bi aheng in. Ango aa’ye. Malika piştî vê malikê **husn-u metle**’ e. Ji malika paşîn ya Qesîdeyê re **meqte**’ tê gotin. Ji malika berê ya **meqte**’ê re **husn-meqte**’ tê gotin.

Helbestvan dema qesîdeya xwe dinivisîne li ser hinek tiştan bêtir baldar e û bal dikişîne ser hin xalên girîng. Li gorî vê **husn-u metle**’ ji **metle**’ê, **husn-u meqte**’ ji **meqte**’ê xweştir e. Ji malika herî xweş ya qesîdeyê re **tacbeyt** ya jî **sermalik** tê gotin. Helbestvan piranî di malika **meqte’**ê de navê xwe bi kar tîne. Lê dibe ku di malikên beriya malika **meqte**’ê de jî bi kar bîne. Her wiha helbestvan pirê caran di malikên ku du’ayan dike de navê xwe tîne zimên.

Pirên helbestvanan bernav bi kar tînin. Dema helbestê dinivisînin ango destpêka helbesta xwe bi bikaranîna bernav nîşan didin.

iii- Beşên Qesîdeyê: Qesîde li gorî mijara xwe li ser 4 beşan ji hev tê veqetandin.

Nesîb ya jî Teşbîb (Destpêk): Ku mijara Qesîdeyê evîn be destpêk bi navê **nesîb** tê gotin. Lê ku mijar cuda be û cur be cur be **teşbîb** tê gotin. Destpêkên qesîdeyê li gorî mijarên xwe hatine binavkirin: Ku mijar demsala biharê be; Bahariye, ku zivistan be Şittaiyye û her wiha Temuziyye, Îdiyye, Sûriye têne binavkirin. Qesîde bi xwe jî ji ber van mijaran û beşa ***nesîb***ê hatine binavkirin.

Hinek helbestvan bê beşa nesîb helbestê dinivisînin.

Medhiyye (Pesin): Piştî beşa nesîbê helbestvan bi malikekê derbasê beşa din ango mijara eslî dibe. Ji vê malikê re **gurizgah** tê gotin. Bi wateya ciyê revê tê bikaranîn. Ji vê beşa ku bi gurizgahê têketin dibe re **meqsed** ya jî **maqsûd** ya jî **medhiyye (pesin)** tê gotin. Di vê beşê de helbestvan yê ku lê **medhan** dike -ku **memdûh** e pesnan dide. Li ser wesfên wî/wê disekine. Li ser camêrî, merdîtî û edalet û hwd. yên wî/wê pesnan dide.

Fexriyye (Xwepesindan): Piştî vê beşê jî derbasî **fexriyyeyê (xwepesindan)** dibe. Di vê beşê de helbestvan behsa xwe dike. Wesfê xwe û helbestvaniya xwe dide. Helbesta xwe diwesfîne û gazinan dike ku kes qîmetê nadê.

Du'a (Niyaz): Di dawiyê de dikeve beşa **du'a**yê. Ji bo ku Xwedê temenekê dirêj bide memdûh du'ayan dike. Di vê beşê de behsa belengazî û feqîriya xwe jî dike ku alîkarî ji bo wî bê kirin. Di vê beşê de **mexlesa** xwe ango navê xwe tîne zimên. Wekî ku me li jorê jî gotibû; ji malika ku helbestvan navê xwe tîne ziman re **tacbeyt** (ya jî **sermalik**) tê gotin.

iv- Binavkirina Qesîdeyê: Qesîde bi xwe ji ber mijara beşa ***nesîb***ê hatine binavkirin. Mijara nesîbê li ser çi be navê qesîdeyê bi wî awayî ye. Wekî mînak: Bahariye, şittaiyye û hwd. Dîsa Qesîde li gorî redîfa wan jî hatine binavkirin. Wekî mînak: ku di qesîdeyê de redîf ango peyva ku malikan bi hev ve girê bide çi be li gorî wê tê binavkirin. Qesîdeya Avê, Qesîdeya Baranê hwd. Yên ku bê rêdîf bin, li gorî dengê (tîpa) kafiyeyê têne binavkirin. Mîmiyye, Qafiyye û hwd.

Dîsa Qesîde li gorî mijarên xwe bi awayê din jî têne binavkirin. Yên ku behsa Yekîtiya Xwedê bikin ji wan re ***tewhîd*** tê gotin. Yên ku e'fûyê ji xwedê bixwaze û xwe bavêje dergeh û dîwana Xwedê ji wan re ***munaca't*** tê gotin. Yên ku li ser Hz. Muhemmed û Her Çar Xelîfeyan bêne nivisandin ji wan re ***na't*** tê gotin. Yên ku li ser Padîşah û Wezîr û Mezinên Deweletê bêne nivisandin ji wan re ***methiyye*** tê gotin.

Qesîdeyên methiyeyê jî li gorî memdûhan têne binavkirin. Yên ku ji bo destpêkirina padîşahî ya jî mîrîtiya mezinan bêne nivisandin ji wan re ***culusiyye*** tê gotin. Yên ku li ser yekê/î bi nexweşî bêne nivisandin û rexne bêne kirin ji wan re ***hîcwiyye*** tê gotin. Hinek jî li ser dîrokê yên ku pesnên wan têne dayîn têne nivisadin. Ji wan re jî ***qesîdeyên dîrokê*** tê gotin.

***v- Di dîwanan de rêzkirina qesîdeyan*:** Di dîwanan de qesîde li gorî mijarên xwe li dû hev têne rêzandin. Pêşî tewhîd, şûn de munacad, şûn de na't şûn de methiye, culusiyye tê. Di hinek dîwanan de hîcwiyye jî heye.

b- Musemmet / Qesîdeyên Musemmet:

Wekî têgînên din yên wêjeyî musemmet jî bingeha xwe ji erebî digire. Ji peyva **smt (sîn, mîm, ttê)** tê der. Wateya bingehîn ya peyva **musemmet**ê bend (ta, ben) ya jî gerdena ku morî û mircan lê têne rêzkirin e. Wateya wêjeyî jî li ser vê yekê derketiye meydanê.

Qesîde ya jî xezelên ku xwedî ahenga hundirîn bin jî ji wan re qesîdeya (ya jî xezela) musemmet tê gotin. Dîsa di dîwanan de helbestên ku ji bendan ango ji du rêzikan zêdetir bêne der re musemmet tê gotin.

Pîvana arûzî ya musemmetê piranî li ser du awayan e.

Yek jê ***mefaîlun mefaîlun mefaîlun mefaîlun*** e

Ya din jî ***mustefilun mustefilun mustefilun mustefilun*** e.

Li gorî van pîvanan malik di nîvî de xwedî aheng e. Ku qesîde ya jî xezel li ser beytan ava bûbe dibe ku çarîn; ku li ser bendan ava bûbe dibe ku bibe musemmen (heştîn).

***c- Ted(z)mîn (dat)*:** Hunerek wejeyî ye. Helbestvan dema ku rêzekê ya jî beytekê ji helbestvanekî din bigire û di helbesta xwe de bi kar bîne ew **ted(z)mîn** dike. Lê divê ku navê xwediyê helbestê bîne ziman û diyar bike. Ku navê xwediyê helbestê ji aliyê her kesê ve bê zanîn dibe ku diyar neke jî. Ted(z)mînkirin piranî li ser helbestên ku ustad têne dîtin tê kirin. Helbestvan dikare helbesta kesê ku ji bo xwe ustad dibîne ted(z)mîn bike.

2- Di Qesîdeyê de Hesabê Ebcedê

Di navbera tîp (herf) û hejmaran (reqem) de ji berê de têkiliyekê hebûye. Ev wekî tiştek pîroz hatiye dîtin. Ji dema Babîlê, Hinda Kevn û Yewnanan ve ev têkilî hatiye danîn û di wêjeyê de wekî *razeke (sir) xwedanî* ji aliyê wêjevan û destanbêjan ve hatiye bikaranîn. Di nivisbariyê de wekî ***Pergala Hesabê Ebcedê*** hatiye binavkirin û hatiye bikaranîn. Jê re ***Hesabê Cemel*** jî tê gotin.

Tabloya Hesabê Ebcedê/Cemelê[1]

Tîpên Erebî	Reqem (Yekîn)	Tîpên Erebî	Reqem (Dehîn)	Tîpên Erebî	Reqem (Sedîn)	Tîpên Erebî	Reqem (Hezarîn)
ا ء	1	ی ێ ي	10	ق	100	غ	1000
ب پ	2	ک گ	20	ر ڕ	200		
ج چ	3	ل ڵ	30	ش	300		
د	4	م	40	ت	400		
ه ە	5	ن	50	ث	500		
و ۆ	6	س	60	خ	600		
ز ژ	7	ع	70	ذ	700		
ح	8	ف ڤ	80	ض	800		
ط	9	ص	90	ظ	900		

Pergala Hesabê Ebcedê; li gorî alfabeya aramî her tîpek bi barek reqemî tê nirxandin. Ev jî li ser 8 peyvên ku niha wateya wan nayê zanîn ya jî bingeha xwe ji ku digirin salix ji wan nayê dayin tê der. Ev peyv ango nav *ebced, hewwez, huttî, kelemen, se'fes, qereşet, sexîz, dazuxîlen* in. Ev peyv rêzkirina li dû hev ya alfabeyê ye. Lê ne ya alfabeya erebî ya îroyîn e.

Li gori hinek rîwayetan tê gotin ku li welatê Medyen 6 qral hebûne. **Ebced, Hewwez, Huttî, Kelemen, Se'fes, Qereşet** her yek navê qralekî bûye. Serdarê van qralan jî **Kelemen** bûye. Piştî ku qewmê Şue'yb diçe helakê ev qral tev têk diçin. Nav (yan jî peyvên) **Sexîz û Dazuxîlen** jî şûn de li wan hatine zêdekirin. Li gorî hinek rîwayetên din jî tê gotin ku ev nav navên Şeytan in. Hinek rîwayet jî dibêjin ku ev navên rojên hefteyê ne.

Bi çi awayî be ev nav wekî ***Ebced*** tê zanîn û alfabeya aramî ye. Li gorî wê her tîpek reqemekê diderbirîne. Hê jî di rêzkirina mijaran de dema ku tîpên alfabeya erebî (aramî) têne danîn li gorî vê rêzkirinê ne. Wekî mînak; li gorî ا, ب, ت, ث, ج, ح..... nayên rêzkirin; ا, ب, ج, د ..... têne rêzkirin.

Di wêjeya klasîk de bi taybetî ev hesabê ebcedê (cemel) ji bo bûyer, bûyîn, mirin, daketin û rabûnan di helbestan de wekî hunerekê wêjeyî hatiye bikaranîn. Hozanvan û helbestvanên ku bi kar ne anî be tune ye.

3- Pîvan û Rêzbendiya Qesîdeyê

Navê Qesîdeyê:	Newaya Mutribê Çengê
Tewrê Qesîdeyê:	Tewhîd (Evîna Xwedê)
Navê Pîvana Qesîdeyê:	Behra Hezec a Salima Musemmen
Pîvana Qesîdeyê ya Arûzî:	mefaîlun mefaîlun / mefaîlun mefaîlun
Pîvana Qesîdeyê ya Kîteyî:	16 (8+8)
Pîvana Qesîdeyê ya Îşarkî:	. _ _ _ . _ _ _ / . _ _ _ . _ _ _
Rêzbenda Qesîdeyê:	kafîye li ser 4 rêzan e. Her wiha; a a x b/c c x b/d d x b...
Barê Pîvana Qesîdeyê:	Ne-wa-ya mut-ri bê çen-gê fi-xan a-vê-te xer-çen-gê We-re sa-qî he-ta ken-gê ne şû-yîn dil ji wê zen-gê
Pîvana Li ser:	Me-fa-î-lun me-fa-î-lun me-fa-î-lun me-fa-î-lun

4- Li gorî destnivîs û çavkaniyên di destê me de metna qesîdeyê

Li gorî van agahiyan ku em werin ser ***Qesîdeya Musemmet ya Melayê Cizîrî*** em ê van pirsan ji xwe bikin: 1) Ji dema ku Mela gotiye/nivisandiye heta niha guhertin çêbûne yan na? Ku çêbûbin bi çi awayî çêbûne? 2) Mela çima Qesîdeya Musemmet ya bibend bi kar aniye? Di vê qesîdeyê de huner û felsefeya xwe daye ber kîjan hozanvanî? Vê danberheviyê bi çi awayî û bi kîjan mexsedî bi kar aniye? 3) Mela mexlesa xwe li ser kîjan navî û bi çi awayî bi kar aniye? Di vê qesîdeya xwe ya ku wekî destpêka dîwanê tê zanîn de dem-diyarkirin bi hesabê ebcedê di kîjan malikê/bendê de û bi çi awayî bi cih kiriye?

Newaya Mutribê Çengê

Navê Qesîdeyê: Newaya Mutribê Çengê[2]
Tewrê Qesîdeyê: Tewhîd (Evîna Xwedê)
Navê Pîvana Qesîdeyê: Behra Hezec a Salima Musemmen[3]
Pîvana Qesîdeyê ya Arûzî: mefaîlun mefaîlun / mefaîlun mefaîlun
Pîvana Qesîdeyê ya Kîteyî: 16 (8+8)
Pîvana Qesîdeyê ya Îşarkî: . _ _ _ . _ _ _ / . _ _ _ . _ _ _
Rêzbenda Qesîdeyê: Kafîye li ser 4 rêzan e. Wekî a a x b/c c x b/d d x b...
Barê Pîvana Qesîdeyê: Ne-wa-ya mut-ri-bê çen-gê fi-xan a-vê-te xer-çen-gê
We-re sa-qî he-ta ken-gê ne şû-yîn dil ji wê zen-gê
Pîvana Li ser: Me-fa-î-lun me-fa-î-lun me-fa-î-lun me-fa-î-lun

Newaya mutribê[4] çengê[5]   fixan avête xerçengê[6]
Were saqî heta kengê   ne şoyîn dil ji vê[7] jengê[8]
Heyata dil meya baqî   binoşîn da bi muştaqê
Ela ya eyyuhes-saqî   edir ke'sen wena wilha[9/10]

Ku katib dêmê cedwel kit   şikeste xet muselsel kit
Ji yek herfan mufessel kit   kî ye vê muşkilê hel kit
Dizanî rûd û ûd ewwel   çi tavêtin surûd ewwel
Ki işq asan nimûd ewwel   welê uftadê muşkilha[11]

Ji muhra wê şefeq se'dê   şirîn le'lê şeker we'dê
Dinalim şubhetê re'dê   'ecêb im lê ji vê ce'dê
Ki dil ra tabê her çîneş   bi kufrê mêbered dîneş
Zi tabê ce'dê muşkîneş   çi xûn uftadê der dilha[12]

Di vê taqê[13] di vê xanê   me 'eyşû ê minê kanê
Kesê dest dit ji dewranê   nihalik vê gulistanê
Der axûşeş çû mîared   ki ez dil caneş buspared
Ceres firyadê mî dared   ki ber bendîdê mehmilha[14]

Bi Qur'anê bi ayatê   eger pîrê[15] xerabatê
Bebêjit secde bin latê   murîdên wî di bin qatê
Murîd er bê beser nebwed zi fermaneş bi der nebwed
Ki salik bê xeber nebwed   zi resm û rahê menzilha[16]

Ji vê zulmat û deryayê   ji mewcan qet xeber nayê
Şikestî keştiya bayê   'ucacê wê şefeq dayê
Ji herfan mah û salê ma   ne hat der şiklê falê[17] ma
Ku ca danendê halê ma   sibik baranê sahilha[18]

Mera-j ewwel çi bir xamî   kişand axir bi bednamî
Ji rengê Se'diyû Camî   ji şuhret pê hisîn 'amî
Bi deng û bang û awazê   dibêjit nexmeya sazê
Nihan key ma ne dan razê ke zû sazendê mehfilha[19]

Ji Hafiz Qutbê Şîrazê   Mela fehm er bikî razê
Bi awazê ney û sazê   bibê ber çerxê perwazê
Tuzed min hubbîhes-sefwa bîhî ehlul-hewa neşwa
Meta ma telqe men tehwa de'id-dunya we ehmilha[20]

نَوَايَا مُتْرِبِى چَنْگى

ناڤى پيڤانى: بَحْرَا هَزَجْ آ سَالِمَ آ مُسَمَّن
پيڤان: مَفَاعيلُن مَفَاعيلُن / مَفَاعيلُن مَفَاعيلُن
كيته: ١٦ (٨+٨)
ريزبَنْد: كافيه ل سەر ٤ ريزانه . هَر وها;
رَوْشَا إشارْكى: . _ _ _ . _ _ _ . _ _ _ . _ _ _
بارى پيڤانى: نَوَايَا مُتْرِبِى چَنْگى فِغَانْ آ ڤيتَ خَرْچَنْگى
وَرَهْ سَاقى حَتَا كَنْگى نَشويينْ دِلْ ژِ ڤى ژَنْگى
پيڤانا ل سەر: مَفَاعيلُن مَفَاعيلُن / مَفَاعيلُن مَفَاعيلُن

١/١ نَوَايَا مُتْرِبِى[١] چَنْگى[٢] فِغَانْ آ ڤيتَهْ خَرْچَنْگى
وَرَهْ سَاقى حَتَا كَنْگى نَشوينْ دِلْ ژِ ڤى[٣] ژَنْگى[٤]
٢/٢ حَيَاتَا دِلْ مَيَا بَاقى بِنوشِنْ دَا بِمُشْتَاقى
أَلا يَا أَيُّهَسَاقي أَدِرْ كَاسًا وَنَاوِلْهَا[٥/٦]

٣/٣ كُو كَاتِبْ دِمِ جَدْوَلْ كِتْ شِكَسْتَهْ خَتْ مُسَلْسَلْ كِتْ
ژِ يَكْ حَرْفَانْ مُفَصَّلْ كِتْ كِيهْ ڤى مُشْكِلى حَلْ كِتْ
٤/٤ دِزَانى رُودُو عُودْ أَوَّلْ چِه تَا ڤين سُرُودْ أَوَّلْ
كِهْ عِشْقْ آسَانْ نِمُودْ أَوَّلْ وَلى أُفْتَادِ مُشْكِلْهَا[٧]

٥/٥ ژِ مِهْرَا وى شَفَقْ سَعْدى شِرينْ لَعْلى شَكَرْ وَعْدى
دِنَالِمْ شُبْهَتى رَعْدى عَجِيبِمْ لى ژِ ڤى جَعْدى
٦/٦ كِهْ دِلْ رَا تَابِ هَرْ چِينَشْ بِكُفْرى مى بَرَدْ دينَشْ
ژِ تَابِ جَعْدِ مُشْكينَشْ چِهْ خُونْ أُفْتَادِ دَرْ دِلْهَا[٨]

٧/٧ دِ ڤى طَاقى دِ ڤى خَانى مَهْ عَيْشْ و إيمى كَانى
كَسى دَسْتْ دِتْ ژِ دَوْرَانى نِهَالِكْ ڤى گُلِسْتَانى
٨/٨ دَرْ آغُوشْ چُو مى آرَدْ كِهْ أَزْ دِلْ جَانَشْ بُسْپَارَدْ
جَرَسْ فِرْيَادِ مى دَارَدْ كِهْ بَرْ بَنْدِيدِ مَحْمِلْهَا[٩]

٩/٩ بِقُرْآنْ بِآيَاتى أگَرْ پيرِ[١٠] خَرَابَاتى
بَهْ بيژِتْ سَجْدَهْ بِنْ لاتى مُريدينْ وى دِ بِنْ قَاتى
١٠/١٠ مُرِيدْ أَرْ بى بَسَرْ نَبْوَدْ ژِ فَرْمَانَشْ بِدَرْ نَبْوَدْ
كِهْ سَالِكْ بى خَبَرْ نَبْوَدْ ژِ رَسْمُ و رَاهِ مَنْزِلْهَا[١١]

١١/١١ شَڤى ظُلْمَاتْ و دَرْيَايى ژِ مَوْجَانْ قَتْ خَبَرْ نَايى
شِكَسْتى كَشْتِيَا بَايى عَجَاجى وى شَفَقْ دَايى
١٢/١٢ ژِ حَرْفَانْ مَاهْ و سَالِ مَا نَهَاتْ دَر شِكْلِ فَالِ مَا
كُجَا دَانَنْدِ حَالِ مَا سِبُكْبَارَانِ سَاحِلْهَا[١٢]

١٣/١٣ مَرَا ژِ أَوَّلْ چِه بِرْ خَامى كِشَانْدْ آخِرْ بِه بَدْنَامى
ژِ رَنْگِ سَعْدِيُو جَامى ژِ شُهْرَتْ پى حَسِنْ عَامى
١٤/١٤ بِدَنْگُ و بَانْگُ آوَازى دِبيژِتْ نَغْمَه يَا سَازى
نِهَانْ كَىْ مَا نَدَانْ رَازى كَزُو سَازَنْدِ مَحْفِلْهَا[١٣]

١٥/١٥ ژِ حَافِظْ قُطْبى شيرَازى (مَلا) فَهْمْ أَرْ بِكى رَازى
بِآوَازْ نَىْ و سَازى بِهْ بى بَرْ چَرْخى پَرْوَازى
١٦/١٦ تُزَدْ مِنْ حُبِّهَا سْفْوَى بِهِ أَهْلُ الهَوَى نَشْوَى
مَتَى مَا تَلْقَ مَنْ تَهْوَى دَعِ الدُّنْيَا وَأَهْمِلْهَا

5- Bikaranîna Nav (Mexles) û li nava rêzên qesîdeyê danîna dîrokê (Hesabê Ebcedê):

a- Bikaranîna Mexlesê**:** Mela mexlesa xwe li ser gelek navan û bi çi awayê hunerî bi kar aniye.

Melayê Cizîrî di **Dîwan**a xwe de gelek navan bi kar anîye. Ev navên ku bi kar aniye ya wesfê wî, ya li gorî têgihiştina xwe ya tasawufî binavkirinên ku wî li xwe daniye û ya jî navê xwe yê ku tê zanîn bi kar aniye.

Melayê Cizîrî di Dîwana xwe de herî zêde mexlesa MELA bi kar aniye. Li dû wê MELÊ bi kar aniye. Di Dîwanê de NÎŞANÎ û EHMED jî bi kar aniye.

Di Dîwanê de: Wekî mexles 76 car **Mela**, 38 car **Melê**, 8 car **Nîşanî**, 6 car **Ehmed** bi kar hatiye. Ji vê tê derxistin ku Melayê Cizîrî bi navê xwe yê **Mela** hatiye naskirin û wî jî wisa xwestiye. **Melê** jî tewandina heman navî ye. Ji ber vê mirov kare **Melê** jî wekî Mela bihesibîne. Mexlesa **Nîşanî** mirov di dîwanê de tê derdixîne ku di navbera xwe û evîna xwe de (Evîna Xwedê) wekî navek taybet bi kar aniye. **Ehmed** jî li gorî çavkaniyên ku tînin ziman û di dîwanê de tiştê ku li ser **Ehmed** bal dikişîne navê wî yê eslî ye.

Melayê Cizîrî di vê Qesîdeya xwe ya Musemmet ya bi navê Newaya Mutribê Çengê de mexles wekî **MELA** di çarîna dawîn rêzika pêşî û serê heştkîteya duyem de bi kar aniye.

*Ji Hafîz Qutbê Şîrazê **MELA** fehm er bikî razê*
Bi awazê ney û sazê bibê ber çerxê perwazê
Tuzed min hubbîhes-sefwa bîhî ehlul-hewa neşwa
Meta ma telqe men tehwa de'id-dunya we ehmilha

b- Di Qesîdeyê de Hesabê Ebcedê**:** Li gorî hinek lêkolîneran; Melayê Cizîrî di vê qesîdeya xwe ya ku wekî destpêka dîwanê tê zanîn de dem-diyarkirin bi Hesabê Ebcedê di çarîna şeşan de û bi awayek veşartî bi cih kiriye.

Zeynelabidîn Zinar di pêşgotina Dîwana Melayê Cizîrî ya ku wî latînîze kiriye de ji bo malika ku Mela hesabê Ebcedê tê de bi kar aniye wiha dibêje:

> *"Çaxê wergerandina Dîwanê, em li malika dozdeyan (çarîna 6'an) ya di beşa destpêkê de (Qesîdeya Destpêkê; Newaya Mutribê Çengê) ketim gumanê ku tê de tarîxek heye. Malik ev e:*
>
> *Ji herfan mah û salê ma, ne hat der şiklê xalî ma*
> *Kuca danendê halê ma, sibik baranê sahilha*
>
> *Me vê malika li jor li gor hesabê Ebcedê pişkaft. Lê ji ber ku Dîwan gelek caran hatiye çapkirin, bêguman di bêjeyan de gelek guhartin çêbûne. Îcar ev "şiklê xalî" di hinek çapan de bi "şiklê falê" hatiye nivisandin. Lê di çapa Dîwana Bexdadê de bi "şiklê xalî" nivîsiye. Ev çap jî ya Muhemed Elî Ewnî ye. Me xwe bi vê piştrast kir û tarîxa ji dayikbûna mela ji bêjeya "herfan" û "xalî" derxist holê, ku dike 980. Îcar ev tarîx ya Hîcrî be, beramberî ya Mîladî dike 1570."* [21]

Birêz Celalettin Yoyler li hember Zeynelabidîn Zinar wiha gotiye:

> *"...Lewre birêz Zeynelabidîn hejmara tîpên bêjeya (herfan û xal) bi hesabê ebcedê 980 derxistiye. Mixabin bêjeyên ku Zeynelabidîn Zinar bi hesabê ebcedê nirxandiye ne beramberî 980 tên, lê belê beramberî 970 tên. Lewre wî "herfan û xal" bi hesabê ebcedê hejmartiye û gotiye: "Hejmar li ser hev beramberî 980'yî tên. Em ê wan tîpên bêjeyan yek bi yek deynin ser rûpelê û binirxînin: (H)8+(R)200+(F)80+(E ya A)1+(N)50+(X)600+ (E ya A)1+(L)30=970'ê koçî. (...) 970+622= 1561 mîladî . Hem jî xebitandina bêjeya "xal" di şûna "sal" de jî bi guman e. Lew re nusxeyên ku di destê me de hene, bi giştî "ji herfan mah û salê ma" hatine nivisandin...."* [22]

Rêzdar Nayif Mikaîl Tahir di pirtûka bi navê **"Şeyxul Cezerî, Nehcuhu ve 'Eqîdetuhu Min Xilal Dîwanihi El-Şi'rî"** bi awayekî din hesabê ebcedê li ser heman rêzika Mela bi kar tîne. Wekî Zeynelabidîn zinar bi tenê du peyvan nagire dest. Rêzê tev li gorî hesabê ebcedê dihesibîne. Wiha reng e:

> *Herfa=289, Mah=46, û(w)sal=97, ma=41, şikl=350, fal=111, ma=41 bi tevahî =975 dike. Ev jî li gorî*

mîladî 1567 dike." Di heman pirtûkî de Nayif Mikail Tahir li ser (HERFA) disekine û dibê ku *"Elîf"a wê tune ye û li gorî wê **yek** (hejmara Elîfê 1 e) dikeve û dimîne 974. Her wiha dibê ku "herfa" wekî pirjimarî bi kar bianiyana wê bigotana "herfên". Ji lew re dibe ku ew "a" ango "elîf"a wê tune ye.*[23]

Ku Mela di vê rêzika ku li ser şîrove têne kirin û li hesabê ebcedê tê xistin de tarîxê danîbe sê çavkanî û lêkolînerên cuda cuda dibêjin û hesabê wan cuda der tê. Di vir de hawê ku Rêzdar Zeynelabidîn dibê Hîcrî 980 be li gorî mîladî dike 1572. Bi çi awayî hesabê ebcedê bi kar aniye di pêşgotina pirtûka xwe de ne aniye ziman. Ku li gorî wî 980'yî hîcrî be li gorî mîladî dike 1572 û 2 sal ferq dike. Dibe ku ji hicrî wergerandina mîladî de çewtî kiribe.

Rêzdar Celalettin Yoyler li ser hesabê Zinar çûye û lê di nava bêjeyan de tevlîhevî kiriye. "Falî/ê û xalî" ya ku Zinar haniye nîqaşê "salî ma" tevlî vê kiriye û bêtir li hev xistiye. Bi vî awayî Zinar pûç kiriye û li cihekî din li gorî hesabê ebcedê jiyana Mela hesab kiriye.

Her wiha Birêz N. Mikaîl Tahir jî rêzika ku Zeynelabidîn Zinar bi tenê "herfan" û "fal/xal" derxistiye tevekî bi hev re hesab kiriye û li "Elîf"a "herfa" aliqiye û salekê kêm/zêde hesab kiriye.

Ji vê zulmat û deryayê ji mewcan qet xeber nayê
Şikestî keştiya bayê 'ucacê wê şefeq dayê
Ji herfan mah û salê ma ne hat der şiklê falê ma
Ku ca danendê halê ma sibik baranê sahilha

6- Çavkaniyên ku me serî li wan daye:

Versîyonên Dîwana Melayê Cizîrî yên ku di destê me de ne û me daye ber hev ev in:

1- Dîwana Melayê Cizîrî, bê şîrove ye, Çapa Elî Feqqe Muhemmed Nûrî. Ev Dîwan li Metbe'e Dar-ul Kîtab-ul Erebî ya Misirê çap bûye.
2- Destnivîsa Dîwanê ya Muhemmed Sebriyê Lawê Mela Ebdulfettahê Herşenî ku di sala 1341 16'ê Temûzê de ji aliyê Herşenî bi xwe ve hatiye nivisandin.
3- Ehmedê Lawê Mela Muhemmedê Buhtî yê Zivingî ku di sala 1958-59'an de tevî şerha erebî wekî du cild hatiye çapkirin. Du çapên wê di destê me de ne. Yek jê Cilda yekemîn di sala 1958'an, cilda duyemîn di sala 1959'an de li "Tebe'e Fî Metbe'et-irRafidîn" li Qamişlû hatiye çapkirin. Ya din sala çapa wê û çapxaneya wê ne diyar e. Ew jî wekî 2 cild hatiye çapkirin. Di sala 1984'an de Mele Mehemed Emînê Çawşelikî vê çapê bi dest xistiye.
4- Şerha Dîwana Şeyxel Cezîrî, ya Mela Ebduselamê Lawê Murad el Cezîrî, di sala 2004'an de li Dihokê di nava Weşanên Spîrêz de hatiye çapkirin.
5- Dîwana Melayê Cizîrî, Zeynelabidîn Zinar, Firat Yayinlari, 1986
6- Şîroveya Dîwana Melayê Cizîrî; Celalettin Yoyler, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê , Avrêl 2006
7- Melayê Cizîrî Divani'nin Şerhi, Abdulmukit Septioglu, Weşanên Nûbihar, 2005

Têbinî :

(1) Çavkaniyên ku Hesabê Ebcedê/Cemelê hatiye lêkolîn û piştrastkirin ev in:
- El-Muncid Fil-luxetî Wel-E'lam, Beşa Elîf Rûpel: 2 Çapa 13emîn, Lubnan-Beyrût,1975
- Şeyxul Cizîrî Nehcuhu we E'qîdetuhu, Mîn Xilal Dîwanihil Şi'rî Rûpel: 29 – Naîf Mikaîl Tahir Duhok-2005
- Tasawuf Terimleri ve Deyimler Sözlüğü Rûpel: 178 – Prf. Dr. Ethem Cebecioglu
- Ferheng-i Farisî rûpel: 44 Dr. Mehmûd Mu'nî Tehran-1384 h.
- Gencine-i Guftar Ferhengî Ziya Cild 1 rûpel: 99 Ziya Şukûn MEB Istanbul - 1996

(2) Di hemû çap û destnivîs û şîrove/şerhên ku Dîwana Melayê Cezîrî de (yên ku di destên me de ne) navê vê Qesîdeya Musemmet ya Mela wekî "Newaya Mutribê Çengê" derbas dibe. Lê bi tenê di nusxeya ku ji aliyê Zeynel Abidîn Zinar ve hatiye latînîzekirin û çapkirin de wekî nav "Sirê Meygêr" derbas dibe. Me li ser vê yekê navê qesîdeyê "Newaya Mutribê Çengê" diyarde dît. Em bawer in Mela jî navê wê heman tişt daniye.

*(3) **Behra Hezec** di wêjeya Kurdî ya klasîk de gelek caran hatiye bikaranîn. Di zimanê Erebî de tê wateya "strîna bi dengê xweş û bilind". Di pîvana Erebî de behra 6'mîn e. Di pîvana Farisî de bi gelek awayan hatiye bikaranîn. Di Farisî de 28 qalib li ser vê behrê hatine bikaranîn. Her wiha 24 qalibên "rubaî" (çarîn) li ser vê pîvanê hatine bikaranîn. Di wejeya klasîk ya Kurdî de nayê zanîn ku vê behrê bi çend qaliban hatiye bikaranîn.*

Ehmedê Xanî di Nûbara Biçûkan de vê behrê bi navê Behra Hezec a Salim a Musemmen ku qalibê wê ***mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun*** *e di beşa Nûbarê ya 12'mîn de bi kar anî ye. Xanî wekî malik (beyît) vê bi kar anî ye. Di vê çarîna Melayê Cizîrî de jî ev behr û ev qalib hatiye bikaranîn. Li ser pîvana vê em vê pênasê tînin: "Behra Hezec" tê wateya "bi dengê xweş û bilind strîn"; "salim" tê wateya "xweş û baş û dilrehetî"; "musemmen" tê wateya "heştîn ango heştkîteyî". Behra Hezec a Salima Musemmen: Bi dengê bilind û xweş heşteheşt strandin e.*

[4] Di Şerha Dîwanê ya bi Erebî ya ku ji aliyê Ehmedê Lawê Mela Muhemmedê Zivingî ve hatiye nivisandin; Mele Ebdusselamê Ceziri di şerha xwe de û çapa Feqî Muhemmed Nûrî de ev peyv wekî "mutrib û çengê" hatiye nivisandin. Lê di destnivîsa Muhemmed Sebriyê Lawê Mela Ebdulfettahê Herşenî de "mitribê cengê" hatiye nivisandin. Li gorî me jî ya Herşenî çêtir e. Hem ji bo pîvanê guncantir e û hem jî ji bo qedîneka rêzimanî guncantir e. Li gorî me Mela dema nivîsiye gotiye "mutribê çengê". Newa bi xwe ya mutrib e. Ew mutribê ku li çengê dide. Ango "Newaya mutribê çengê" rasttir e û bêtir li cih rûdinê. Lê di peyva "mutrib" de di heman çavkaniyê ya Seydayê Herşenî de wekî "mitrib" hatiye nivisandin. Li gorî me "mutrib" rasttir e. Me di malikê de wekî "mutrib" nivisand.

- Mutrib; peyvek bi Erebî ye. Ji lêkera Erebî ya bi navê TERIBE'yê tê. Ji bingeha TERIBE tê wateya wê "şênik, yê/a ku xweşî û şadiyê dide der û dorê û xwezayê; ji karê wî kesî/ê re TERIBE, ji wî/ê re MUTRIB tê gotin. Di bingehê de ji tevger û lêdanê tê. Kesê ku li amûrekî/ê muzîkê bide jê re MUTRIB tê gotin. Her wiha kesê/a ku stranan bibêje jî mutrib e.

- Di nava Kurdan de mutrib wateyekê din jî girtiye. Kesên ku di nava gel de bigerin, li saz û tembûrê bidin û pê re stranan bibêjin; bi wî awayî debara xwe bikin hene. Ev wekî koçeran in. Bi koçerî dijîn. Wekî êlekî hene û li herêmên ku ji xwe re diyar kirine digerin. Li henek ciyan ji wan re Mitrib ya jî Mirtib tê gotin.

- Di wêjeya klasîk de û di tasawufê de wekî mey, şerab, saqî ew jî xwediyê wateyek taybet e. Di tasawufê de yê/a ku deriyê raza îlahî vedike, rastiyê (heqîqetê) vedibêje, dilê mezin û arifan durist dike û bi vî awayî dilan xweş bike, şewqê bigihîjîne û rûyan geş bike Mutrib e. Mirovê ku gihîjtî be ew Mutrib e.

[5] Seydayê Herşenî di destnivîsa xwe de di dewsa "çengê" de "cengê" nivisandiye. Li gorî me ev ne rast e. Ya rast ew e ku wekî "çengê" hatiye bikaranîn. Çeng nave amûrekê muzîkê ye.

[6] Xerçeng: bircekî ezmanî ye. Di feleknasiyê û di astrolojiyê de ji 12 bircan yek e. Birca Kêvjalê tê gotin.

[7] Seydayê Herşenî di destnivîsa xwe de "wê" gotiye; lê di heman nivîsê de bi heman pênûs û hubrê li seriya "wê" "vê" jî daniye. Dibe ku lê emîn nebûye ji ber wê jî "vê" jî li ser daniye.

[8] Seydayê Herşenî di heman destnivîsa xwe de di dewsa "jengê" de "zengê" nivisandiye. Niha li gelekî herêman ev peyv wekî "zengê" tê bikaranîn. Lê li gorî dîtina me ev peyv wê dema ku Melayê Cizîrî nivisandiye bi rengê "jengê" bûye. Li gorî bêjenasiyê di werara bejeyên Kurdî de dengê "j" û yê "z" diguherin hev. Ev jî nîşaneya wê ye.

[9] Ev rêzik bi tevayî Erebî ye. Wateya wê jî ev e: "Ela ya eyyuhes-saqî edir ke'sen wena wilha" (Ey meyger bigerîne qedehê, bigehîjîne min jî wê.") Ev rêzik bi tevahî ji Hafizê Şîrazî hatiye wergirtin. Di vir de Melayê Cizîrî Ted(z)mîn kiriye. Ji Dîwana Hafizê Şîrazî xezela wî ya pêşîn tedmîn kiriye û pê qesîdeya xwe ya musemmen honandiye.

- Di vir de tiştek balkêş heye. Melayê Cizîrî qesîdeya xwe ya serê Dîwana xwe bi hunera TED(Z)MÎNÊ daye ber xezela Hafizê Şîrazî. Xezela Hafizê Şîrazî bi tevahî ev e: Binêre li xezela Hafizê Şîrazî ya bi navê "Ela ya eyyuhes-saqî edir ke'sen wena wilha".

- Perwîz Cîhanî li ser ted(z)mîna Melayê Cezîrî wiha nivisandiye: "….ne tenê ev helbesta dawî, belkû hemû helbestên ko di wê têhelkêşê da li kutaya bendan da hatine û hejmara wan heft nîvmalik in, di gel nîvmalika yekem ko dibe heşt nîvmalika, hemû jî yên Hafizê Şîrazî ne. Ev helbesta yekem ya dîwana Cîzîrî têhelkêş wate tezmîna yekimîn xezela Dîwana Hafizê Şîrazî ye û ew jî nîvetezmîneke ji dîwana Yezîdê kurrê Muiavîye. ...Herwekî ko hate nivîsînê, Melayê Cizîrî yekimîn Xezela dîwana Hafizê Şîrazî tezmîn kirîye. Lê tezmîna Mela jî tezmînek

الا یا ایها الساقی ادر کاسا و ناولها

الا یا ایها الساقی ادر کاسا و ناولها
که عشق آسان نمود اول ولی افتاد مشکل‌ها

به بوی نافه‌ای کاخر صبا زان طره بگشاید
ز تاب جعد مشکینش چه خون افتاد در دل‌ها

مرا در منزل جانان چه امن عیش چون هر دم
جرس فریاد می‌دارد که بربندید محمل‌ها

به می سجاده رنگین کن گرت پیر مغان گوید
که سالک بی‌خبر نبود ز راه و رسم منزل‌ها

شب تاریک و بیم موج و گردابی چنین هایل
کجا دانند حال ما سبکباران ساحل‌ها

همه کارم ز خود کامی به بدنامی کشید آخر
نهان کی ماند آن رازی کز او سازند محفل‌ها

حضوری گر همی‌خواهی از او غایب مشو حافظ
متی ما تلق من تهوی دع الدنیا و اهملها
ی

Qesîdeya Hafizê Şîrazî
(Elaya Eyuhes-Saqî Edir Ke'sen Wena Wilha)

taybetî ye. Mela tenê malka yekem û hemû nîvmalikên duwem yên wê xezelê tezmîn kirîye. Wate ji bilî malika yekem, nîvmalkên yekem yên hemû malikan avêtîye û tenê li ser nîvmalikên duwem yên wê xezelê têhelkêş saz kirîye…." (Bnr:http://www.nefel.com/articles/article_detail.asp?RubricNr=2&ArticleNr=1594)

- Wekî ku di xezela Hafizê Şîrazî de xuya ye 7 malik (beyt) di vê xezelê de hene. Melayê Cizîrî di Tad(z)mîna xwe de rêza yekem ya xezela Hafizê Şîrazî di çarîna xwe ya yekemîn wekî rêzika dawîn bi cih kiriye. Rêza malika yekem ya xezela Hafiz jî di çarîna xwe ya duyemîn de wekî rêzika dawîn bi cih kiriye. Ji wê bi şûn de her 6 malikên mayî yên xezela Hafiz rêzikên wan yên dawîn di her çarînên xwe de wekî rêzika dawîn bi cih kiriye. Û bi vî awayî qesîdeya xwe ya musemmet honandiye.

(10) Ev çarîn bi tevayî di destnivîsa Seydayê Herşenî de bi vî rengî ye:

Newaya mutribê cengê fixan avête xercengê
Were saqî heta kengê ne şo dil ên ji wê(vê) zengê
Heyata dil meya baqî binoşîn da bi muştaqê
"Ela ya eyyuhes-saqî edir ke'sen wena wilha"

(11) Seydayê Herşenî di destnivîsa xwe de evê çarînê bi vî rengî nivisandiye.

Ku katib dêmê cedwel ket / Şikesti xet muselsel ket
Ji yek herfan mufessel ket / Ki ye vê muşkilê hel ket
Dizanî rûd û ûd ewwil / Çi tavêtin surûd ewwil
Ki işqê asan nimûd ewwil / Welê uftadê muşkilha

- Seydayê Herşenî di vê çarînê de di dewsa 'kit' de 'ket' bi kar aniye. Her wiha di dewsa 'ewwel' de 'ewwil' bikaraniye. Ev bikaranîn ji aliyê weznê ve zêde pirsgirêk dernaxin. Ji aliyê devikî ve hinek cudatî dertê holê. Her wiha di zimanê Erebî de peyv bi xwe hem nivîskî û hem jî di telefuzê de 'ewwel' e. Şeddeya erebî hatiye bikaranîn. Her du deng hev dixwun diguherin dengekî bi tenê. Lê di bikaranîne Kurdî de ev ditewe. Di nava Kurdan de wekî peyvên bi vî rengî ev peyv jî wekî 'ewwil' bi kar tê. Seydayê Herşenî di vê de bilêvkirina Kurdî bikaraniye. Dîsa Seydayê Herşenî di rêza dawîn de gotiye "Ki işqê..." lê dema rêz bi vî rengî bê gotin pîvan xira dibe. Li gorî me ev "Ki işqê(i)..." nîn e, "Ki işq..." e. Di ya Zeynelabidîn Zinar û Şîroveya Celalettin Yoyler de di latînîze kirinê de hinek şaşî hatine kirin. Zeynelabidîn Zinar û Celalettin Yoyler di vê çarînê de "ewwel" wekî "ewel" nivisandine. Ev jî rêzik ango mailkê ji pîvana arûzî dixîne. Dîsa Zeynelabidîn Zinar rêzika dawîn ya ku Mela ji Hafiz ted(z)mîn kiriye -ku bi farisî ye wekî "ke 'işq asan…" Celalettin Yoyler jî heman rêzikê wekî "kî eşq asan…." nivisandiye. Her du jî çewt in. Ya rasttir ew e ku li gorî telefuza farisî "ki 'işq asan nimûd ewwel…" ye.

(12) Seydayê Herşenî di destnivîsa xwe de ev ê çarînê bi vî rengî nivisandiye:

Ji muhra wê şefeq se'dê Şirîn le'lê şeker we'dê
Dinalim şubhetê re'dê Ecêb im lê (ji) vê ce'dê
Ki dil ra tabê her çêneş Bi kufrê mêbered dêneş
Zi tabê ce'dê muşkêneş Çi xûn uftadê der dilha

- Seydayê Herşenî di dewsa 'mihra wê' de 'muhra wê' nivisandiye. Li gorî me 'muhr' rasttir e ji 'mihr'ê. Her çi qas ji aliyê pîvanê ve guhertinekê neke jî ji aliyê bilêvkirina kurdî de 'muhr' rasttir û çêtir e.

(13) Di destnivîsa Seydayê Herşenî û şiroveya Mela Ebdusselamê Lawê Murad El Cezîrî ya ku li Dihokê di weşanên Spîrêz de di sala 2004'an de derketiye de wekî "tavê" hatiye nivisandin. Lê di çapa Feqî Nûrî ya Misrê de, di şerha Zivingî û ya Celalettin Yoyler û Zeynelabidîn Zinar û yên din de wekî "taqê" derbas dibe.

(14) Seydayê Herşenî di destnivîsa xwe de ev ê çarînê bi vî rengî nivisandiye:

Di vê tavê divê xanê me 'iyşû ey menê kanê
Kesê dest dit ji dewranê nehalik vê gulistanê
Der axûşeş çih mîared ki ez dil caneş pisyared
Ceres firyadê mî dared ki ber bendîdeh mehmilha

- Seydayê Herşenî di dewsa 'eyşû de 'iyşû, di dewsa "ê minê" de "ey menê", di dewsa "nihalek" de "nehalek", di dewsa "buspared" de "pisyared" nivisandiye. Ev cudahî hêjayê lêhûrbûnê ne ku mirov li çavkanî û destnivîsên din yên ku hene jî peyda bike û bide ber hev. Her wiha dibe ku ji destnivîsê xal û xêz jê çûbin jî…

(15) Di çapa Feqe Muhemmed Nûrî ya Misirê û ya Zivingî de peyva "pîrê" bi kîteya vekirî hatiye qedandin, ango (y)ya tîpên Erebî nehatiye danîn. Lê di destnivîsa Seydayê Herşenî de bi kîteya girtî û (y)ya tîpên Erebî hatiye girêdan. Li gorî me ya Seydayê Herşenî rasttir e. Ji lew re pîvana vê behrê 'ê'ya dirêj dixwaze.

(16) Seydayê Herşenî di destnivîsa xwe de ev ê çarînê bi vî rengî nivisandiye:

Bi Qur'anê bi ayatê eger pîrê xerabatê
Bibêjit secde bin latê murîdên wî di bin qatê

Murîd er bê beser nebwed ji fermaneş bi der nebwed
Ki salik bê xeber nebwed Ji rah û resmê menzilha

- Seyda di dewsa "zi" de "ji" bikaraniye. Li gorî kurdî "ji" ye. Lê ku rêzik bi farisî be ne "ji" "zi" ye. Her wiha di malika ku ji Hafiz hatiye ted(z)mîn kirin de jî "ji" ye. Daçeka "ji" ya Kurdî di farisî de "zi" ye.

(17) Ev peyv di hemû şîrove û destnivisên ku di destê me de ne wekî "fal" hatiye nivisandin. Lê di ya Zeynelabidîn Zinar de wekî "xal" hatiye nivisandin. Her wiha di destnivisa Seydayê Herşenî de "salê/î ma" û "falê/î ma" li gorî weznê li dû "lam" "y"ya erebî bi kar aniye. Lê di yên din de "sali ma" û "fali ma" ev jî li weznê nayê. Dibe ku ev wekî qusûrê weznê be û dibe ku çewtî be. Ev xal jî hêjayê lêkolîn û lêhûrbûnê ye.

(18) Seydayê Herşenî di destnivîsa xwe de ev ê çarînê bi awayê ku me li jorê daye nivisandiye. Lê di çapa Seydayê Zivingî, a Mele Ebdusselam û ya Feqe Muhemmed Nûrî de bi vî rengî nivisandiye:

Şevê zulmat û deryayê ji mewcan qet xeber nayê
Şikestî keştiya bayê 'ucacê wê şefeq dayê
Ji herfan mah û salê ma ne hat der şiklê falê ma
Ku ca danendê halê ma sibikbaranê sahilha

- Seydayê Herşenî "Ji vê zulmat..." nivisandiye, di çapa Seydayê Zivingî û ya Feqe Muhemmed Nûrî de "Şevê zulmat..." nivisandiye. Seydayê Herşenî "'Ucacê..." nivisandiye, di çapa Seydayê Zivingî û ya Feqe Muhemmed Nûrî de "'Ecacê..." hatiye nivisandin. Li gorî me ya Seydayê Herşenî rasttir e. Her wiha Seydayê Herşenî "y"ya pevkelandinê bi kar neaniye, "deryaê, naê, baê, daê" nivisandiye. Lê di çapa Seydayê Herşenî û ya Feqe Muhemmed Nûrî de "y"ya pefkelîne hatiye bikaranîn. Me vê rast dît û li gorî bilêvkirina Kurdî divê "y" hebe. Me jî vê yekê di teksta xwe de bi kar anî.

(19) Seydayê Herşenî di destnivîsa xwe de ev ê çarînê bi vî rengî nivisandiye:

Mera-j ewwel çi bir xamî kişand axir bi bednamî
Ji rengê Se'diyû Camî ji şuhret pê hisîn 'amî
Bi dengê bang û awazê dibêjit nexmehya sazê
Nihan key ma ne dan razê ke zû sazendê mehfîlha

- Me ji bo pîvanê (di dewsa 'mera ji..." wekî "mera-j..." nivisand) kinkirina kîteyê bikaranî. Ji bo pîvanê divê ku ev bi vî rengî bê nivisandin û bê gotin.

(20) Mela di vê çarînê de di rêzika pêşîn de mexlesa xwe wekî "MELA" bi kar tine û ji aliyê naverokê ve jî encam û têgihiştina herî jor diderbirîne. Her du rêzikên dawî yek jê ya wî ye û bi Erebî ye ya dawîn jî ted(z)mîna Hafiz e ew jî bi erebî ye.

(21) Bnr: Dîwan, Melayê Cizîrî, Firat Yayinlari (Wergeranina Tîpên Latini, Zeynelabidîn Zinar) Rp: 12

(22) Bnr: Şîroveya Dîwana Melayê Cizîrî, Celalettin Yoyler, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Avrêl 2006, Rp: 16

(23) Bnr: Şeyxul Cezerî, Nehcuhu ve 'Eqîdetuhu Min Xilal Dîwanihi El-Şi'rî, Nayif Mikaîl Tahir, Weşanên Spîrêz, 2005 Dihok